

Zanîngeha Artûklû ya Mêrdînê

Enstîtûya Zimanên Zindî yê Tirkîyê

Beşa Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

CÎNAV

DI ZARÊN KURMANCÎ Û SORANÎ DE

Serkan İNCE

13721288

Şêwirmend

Alk. Doç. Dr. Mustafa ASLAN

Mêrdîn - 2018

PÊŞGOTIN

Cînav bi taybetî di warê hînbûn an jî nasîna zimanekî de kilît û pêlînga destpêkê ne. Di her du zarên Kurdî zarê Kurmancî û zarê Soranî de tevî ku di warê cînavan de gellek xebat û lêkolîn hatibin kirin jî encameke çespondî tune ye. Zimannasan hem di zarê Soranî de hem jî di zarê Kurmancî de hejmar û cureyên cînavan bi awayên xwe danîne. Herwiha bi piranî zare û têgehên cînavan jî her zimannasek ji hev cuda bi nav kirine. Ev yek jî karê xwendekar û lêkolerên zimanê Kurdî giran û tevlihev dike. Yeknegirtina ziman rê li ber yeknegirtina xebatên zimannasiyê jî vedike.

Di vê lêkolînê de zare û têgehên rêzimanî bi piranî ji têgehên hevbeş ên zarên Soranî û Kurmancî hatine hilbijartin. Herwiha hewla wê yekê hatiye dayîn ku bi berawirdkirin û hevberkirinê cînavên her du zarên Kurdî bîn nasandin.

Hevjîna min Lorîn Demirel İnce bi zanîna xwe ya di warê edebî û rêzimanî de bi gotûbêjên bi min re gellek xalên şêlû zelal kir. Ez sipasiya wê dikim.

Herwiha ez sipasiya şewirmendê rêzdar Alk. Doç. Dr. Mustafa Aslan dikim ku bi nîşandana rêbaza zanistî û bi tîbîniyên xwe xebata min bi rêkûpêktir kir.

Serkan İnce

KURTE

Di vê siparteyê de li ser cînav û cureyên cînavan di zimanê Kurdî de hatiye rawestan. Armanca bingehîn a vê xebatê ew e ku di zarên Kurdî Soranî û Kurmancî de nav û têgehên hevbeş an jî nêzîk ji bo cînavan bînan bikaranîn û hejmara cureyên cînavan bînan tîkîzîkin.

Bi lêkdan û berawirdkirina xebat û lêkolînên zimannasên Kurdî yê di warê cînavan de hewla wê yekê hatiye dayîn ku ev babet sade û zelaltir bibe. Herwiha ev encama hanê li ser zarên Soranî û Kurmancî hatiye cîbicîkirin.

Di çarçoveya pîvanên zimannasiya giştî de ev xebata bi rêbaza berawirdkirinê pîk hatiye.

NAVEROK

Hejmarên Rûpelan

PÊŞGOTIN	I
KURTE	II
NAVEROK	III
DESTPÊK	1
BEŞA YEKEM	3
CÎNAV - CÊNAW/RANAW (PRONOUNS)	3
1. CURYÊN CÎNAVAN (COREKANÎ CÊNAW)	3
1.1. Cînavên Kesî - Cênawî Kesî (Personal Pronouns)	3
1.1.1. Cînavên Kesî yên Serbixwe - Cênawe Kese Serbexokan	3
1.1.2. Cînavên Kesî yên Pêvebestî (Cênawe Kese Likawekan).....	6
1.2. Cînava Xweyî - Cênawî Xoyî (Reflexive Pronoun)	10
1.3. Cînavên Nîşaneyî - Cênawî Nîşaneyî (Edmonstrative Pronoun)	11
1.4. Cînavên Girêkî - Cênawî Geyener (Relative Pronoun)	12
1.5. Cînavên Pirsyarî - Cênawî Pirsyarî (Înterrojtive Pronoun).....	13
1.6. Cînavên Nediyyar - Cênawî Nadiyyar (Indefinite Pronouns).....	14
1.7. Cînavên Xwedîtiyê - Cênawî Heyî (Possessivev Pronoun)	15
1.8. Cînavkên Jimarîn - Cênawî Jimareyî (Numeral Pronoun).....	16
BEŞA DUYEM	17
LI GOR HINEK ZIMANNASAN CUREYÊN CÎNAVAN	17
2. Hinek Morfîmên ku Wekî 'Cînav' Hatine Binavkirin.....	23
ENCAM	26
ÇAVKANÎ	28
ÇAVKANIYÊN DÎJÎTAL	28

DESTPÊK

Mijara vê lêkolînê cînav e. Di lêkolînê de li ser cînavên her du zarên Kurdî Kurmanciya Naverast ango Soranî û Kurmanciya Jorîn ango Kurmancî(Badînî) hatiye rawestandî. Hem cînavên Soranî û Kurmancî hatine dabeşkirin û destnîşankirin hem jî cînavên her du zaran hatine berawirdkirin.

Di vê lêkolînê de sedema hîlbiyartina babeta cînavan ew e ku aloziyên têkildarê binavkirin û dabeşkirina cînavên her du zarên Kurdî Soranî û Kurmancî Kurdî bîn çareserkin.

Cînav tevî ku bala bi piraniya zimannasên Kurdî kişandibe jî yek ji wan babetan e ku zimannasan di warê navlêkirin, cure û hejmarên wê de xwediyê nêrînê cuda ne. Wate nakok in. Tenê li ser pênaseya cînavê xwediyê heman nêrînê ne. Ew pênase jî ew e ku cînav, li şûna navdêran tên bikaranîn. Di zarê Kurmancî de zimannasan ji bo navlêkirinê, têgehên wekî 'pronav', 'cînavk', 'cînav', 'zemîr', 'bernav' û 'pronom' bi kar anîne. Di zarê Soranî de jî têgehên wekî 'cênaw', 'ranaw' û 'zemîr' tên bikaranîn. Di her du zaran de jî têgeha herî zêde tê bikaranîn û têgeha bilêvkirina wê herî asan 'cînav' e, lewra min jî di vê lêkolînê de têgeha 'cînav'ê bi kar anî.

Di warê dabeşkirina cînavan de jî nêrînê cuda hene, lê li gor pêzanîn û lêkolînê min 8 cure cînav di van her du zaran de hene. 'Cînavên Serbixwe' û 'Cînavên Pêvebestî' ku gellek zimannas wekî cînavên cuda û xweser dabeş kirine; lê belê min her du xistine bin serenava 'Cînavên Kesî'. Herwiha li gor lêkolînê min cînava ku wekî 'Cînava Qertafî' tê binavkirin cînaveke serbixwe nîne; di rastiya xwe de cînaveke kesî ya serbixwe û tewandî ye. Ji aliyê zimannasan ve cînava ku wekî 'Cînava Lihevxiştî' tê binavkirin jî cînaveke serbixwe nîne; di rastiya xwe de kelijandina daçek û cînava nîşaneyî ye.

Kêşeya sereke ya sinifandin û dabeşkirina cînavên Kurdî ew e ku her zimannasek têgeh û navek cuda li cînavan daniye û her zimannasek hejmara cureyan guherandiye. Lewra armanca sereke ya vê lêkolînê ew e ku têgehan hevbeş an jî nêzîkî hev ên Kurmancî û Soranî ji bo navlêkirinê bîn destnîşankirin û cureyên cînavan di çarçoveya berawirdkirina her du zaran de bîn diyarkirin.

Di beşa yekem a vê lêkolînê de min hewla wê yekê da cureyên cînavên her du zaran destnîşan bikim û berawirdiyekê di navbera cînavên her du zaran de bikim.

Di beşa duyem de jî tevî qalkirina binavkirin û nêrînên hinek zimannasan û dabeşkirina wan a cînavan, di dawiya beşê de ew morfîmên ku zimannasan wekî 'cînav' dane destnîşankirin, bi mînakên min hewla pûçkirinê da.

Di encamê de jî tevî kurteya xebatê qala sedem û hokarên tevliheviya li ser navlêkirin û dabeşkirina cînavan hatiye kirin.

BEŞA YEKEM

CÎNAV - CÊNAW/RANAW (PRONOUNS)

Cînav ew morfîm, qertaf an jî peyv in ku li cih û şûna nav û navdêran tên bikaranîn. Di Kurmancî(Kurmanciya Jorîn) de wekî 'cînav', 'cînav', 'zemîr' tê binavkirin. Dema cînav cihê navdêran digire pê re taybetmendiyên wan jî hildigirin.

1. CUREYÊN CÎNAVAN (COREKANÎ CÊNAW)

Li gor lêkolînên ku min kirine di zimanê Kurdî de 8 cure cînav hene. Bi mînakên û bi berawirdkirina zarê Kurmancî û yê Soranî 8 cureyên cînavan wiha ne:

1.1. Cînavên Kesî - Cênawî Kesî (Personal Pronouns)

Cînavên kesî li şûna kesên yekem, duyem, sêyem ên pirjimar û yekjimar tên bikaranîn.

1.1.1. Cînavên Kesî yên Serbixwe - Cênawe Kese Serbexokan

Cînavên kesî yên serbixwe ne. Bêyî ku bi peyvek din re bê kelijandin an jî bestin xwediyê erk û wate ne. Di zarê Soranî de 'min, to, ew, ême, êwe, ewan' cînavên kesî yên serbixwe ne. Di zarê Soranî de bi giştî tewang nemaye û cînavên serbixwe jî natewin.

Di zarê Kurmancî de jî cînavên kesî yên serbixwe 'ez, tu, ew, em, hûn, ew' xwerû ne, 'min, te, wî/wê, me, we, wan' jî ên tewandî ne.

CÎNAVÊN KESÎ YÊN SERBIXWE(CÊNAWE KESE SERBEXOKAN)				
Kes (Kesekan)	Soranî (Kurmancî Nawerast)		Kurmancî (Kurmancî Serû)	
		Xwerû	Xwerû	Tewandî
Yekjimar (Tak)	1	Min	Ez	Min
	2	To	Tu	Te
	3	Ew	Ew	Wî/Wê
Pirjimar (Ko)	1	Ême	Em	Me
	2	Êwe	Hûn	We
	3	Ewan	Ew	Wan

Mînak-1:

Min Kurdîm // **Ez** Kurd **im**.

To Kurdî. // **Tu** Kurd **î**.

Ew Kurde. // **Ew** Kurd **e**.

Ême Kurdîn. // **Em** Kurd **in**.

Êwe Kurdin. // **Hûn** Kurd **in**.

Ewan Kurdin. // **Ew** Kurd **in**.

Mînak-2:

Min dêrsimîm // **Ez** dêrsimî **me**

To dêrsimîy. // **Tu** dêrsimî **yî**.

Ew dêrsimîye. // **Ew** dêrsimî **ye**.

Ême dêrsimîyn. // **Em** dêrsimî **ne**.

Êwe dêrsimîn. // **Hûn** dêrsimî **ne**.

Ewan dêrsimîn. // **Ew** dêrsimî **ne**.

Mînak-3:

Dema Borî

Min sêwim xward. // **Min** sêv xwar.

Min sêwekanim xward. // **Min** sêv xwarin.

To sêwekanit xward. // **Te** sêv xwarin.

Ew sêwekanî xward. // **Wê/wî** sêv xwarin.

Ême sêwekanman xward. // **Me** sêv xwarin.

Êwe sêwekantan xward. // **We** sêv xwarin.

Ewan sêwekanyan xward. // **Wan** sêv xwarin.

Dema Neborî (Dema Niha û Dema Bê)

Min sêweke(ewe) dexom. // **Ez** sêvê(wê) dixwim.

To sêweke(ewe) dexoyt. // **Tu** sêvê(wê) dixwî.

Ew sêweke(ewe) dexwat. // **Ew** sêvê(wê) dixwe.

Ême sêweke(ewe) dexoyt. // **Em** sêvê(wê) dixwin.

Êwe sêweke(ewe) dexon. // **Hûn** sêvê(wê) dixwin.

Ewan sêweke(ewe) dexon. // **Ew** sêvê(wê) dixwin.

1.1.2. Cînavên Kesî yên Pêvebestî - Cênawe Kese Likawekan

Cînavên Kesî yên Pêvebestî (Cênawe Kese Likawekan)					
Kes (Keseke)	Sorani				Kurmanci
	Koma Yekem		Koma Duyem	Koma Sêyem	
	Dema Borî Lêkerên Têper (Katî Rabirdû Karî Têper)	Dema Borî Lêkerên Têneper (Katî Rabirdû Karî Têneper)	Dema Neborî Lêkerên Têper û Têneper (Katî Ranebirdû Karî Têper û Têneper)		
YEKJIMAR (TAK)	1	m	m	m	m, im, me
	2	t	ît(yt)	ît(yt)	î, yî
	3	y	-	at, êt	ø, e
PIRJIMAR (KO)	1	man	în(yn)	în(yn)	n, in, ne
	2	tan	n	n	n, in, ne
	3	yan	n	n	n, in, ne

Di mijara cînavên pêvebestî de ji ber zarê Kurmanci û yê Sorani hinek ji hev dûr dikevin, em ê cihê bi cihê qala wan bikin.

Ji ber Kurdî zimanekî ergatîf-absolîtîf(xwerû-tewandî) e, cînavên pêvebestî li gor têperî û têneperiya lêkeran û demê diguherin.

Di zarê Kurmanci de ergatîfî di dema rabirdû û lêkerên têper de diyar dibe û lêker dikeve bin bandora bireserê/berkarê.

Mînak - 1:

xwarin - lêkereke têper e

Dema Rabirdû:

Min xox xwar.

Wate min yek xoxekê xwariye. Lêker(xwar) ne li gorî kirdeyê, li gor bireserê hatiye danîn û ew jî yekjimar e. Kirde(min) tewandî ye, bireser(xox) netewandî ye.

Min xox xwarin.

Wate min ji yekê zêdetir xox xwarine. Lêker(xwarin) li gor bireserê hatiye danîn ku ew jî pirjimar e. Kirde tewiyaye, bireser netewiyaye.

Mînak - 2:

dîtin - lêkereke têper e

Dema Rabirdû

Te **ez dîtim**.

Min **em dîtin**.

We **ew dît**.

Me **tu dîtî**.

Te, min, we, me: Kirde

Ez, em, ew, tu: Bireser

Dîtim, dîtin, dît, dîtî: Lêker = Rega lêkerê (dît) + cînavên pêvebestî

(-im, - in, ø, -î)

Ji nimûneyan derdikeve ku lêker li gorî bireserê hatine danîn. Wate lêkerê cînava kirdeyê wernegirtiye, cînava bireserê wergirtiye.

Dema Ranebirdû (Dema Niha û Dema Bê):

Ez xoxê dixwim.

Ez xoxan dixwim.

Ez ê sêvê bixwim.

Ez ê sêvan bixwim.

Di dema ranebirdû û lêkerên têper de lêker li gorî cînava kirdeyê(ez,-im) tê danîn. Di van mînakan de ji ber lêker kesê yekemê tak(ez) e, lêker jî cînava pêvebestî ya kesê yekemê tak e.

Di zarê Soranî de cînavên serbixwe natewin, lê cînavên pêvebestî li gorî demê û li gorî têperî û têneperiya lêkerê diguhere. Lê di gellek xalan de ji Zarê Kurmancî cudatir e. Cînavên pêvebestî yê zarê Soranî li ser 3 koman tên dabeşkirin.

Koma Yekem: Dema Borî - Lêkerên Têper

(Katî Rabirdû - Karî Têper)

Di koma yekem de ev cînavana tên bikaranîn: **m, t, y, man, tan, yan**

Mînak:

xwardin - lêkereke têper e

Min xoxekem xward. (Min xox xwar)

Min xoxekanim xward. (Min xox xwarin)

To xoxeket xward. (Te xox xwar)

To xoxekaniit xwardit. (Te xox xwarin)

Ew xoxekey xward. (Wî/wê xox xwar)

Ew xoxekanî xward. (Wî/wê xox xwarin)

Ême xoxekeman xward. (Me xox xwar)

Ême xoxekanman xward. (Me xox xwarin)

Êwe xoxeketan xward. (We xox xwar)

Êwe xoxekantan xward. (We xox xwarin)

Ewan xoxekeyan xward. (Wan xox xwar)

Ewan xoxekanyan xward. (Wan xox xwarin)

Xoxeke: Xoxekî yekjimar û diyar.

Xoxekan: Xoxên pirjimar û diyar.

Ji mînakan jî derdikeve ku di zarê Soranî de ji zarê Kurmancî cudatir di dema boriya lêkerên têper de lêker li gor kirdeyê paşgira cînava pêvebestî werdigire. Herwiha yekjimarî û pirjimariya bireserê jî li ser bireserê bi xwe diyar dibe. Lê di Kurmancî de li ser kar yekjimarî û pirjimariya bireserê diyar dibe.

Têbinî: Di zarê Soranî de cînavên pêvebestî yên koma yekem di heman demê de dema dikeve pişt navan erkê cînava xwedîtiyê hildigire.

Mînak:

wilatim (welatê min)

wilatit (welatê te)

wilatî (welatê wê/wî)

wilat**man** (welatê me)

wilatt**an** (welatê we)

wilat**yan** (welatê wan)

Koma Duyem: Dema Borî - Lêkerên Têneper

(Katî Rabirdû - Karî Têneper)

Di koma duyem de ev cînavên pêvebestî tên bikaranîn: **m, ît/yt/î, ø, îm/yn, n, n**

Mînak-1:

hatin - lêkereke têneper e

Min hat**im**. (Ez hatim)

To hat**ît**. (Tu hatî)

Ew hat. (Ew hat)

Ême hat**îm**. (Em hatin)

Êwe hat**in**. (Hûn hatin)

Ewan hat**in**. (Ew hatin)

Mînak-2:

kewtin - lêkereke têneper e

Min le ser banewe kewt**im**. (Ez ji ser ban ve ketim)

To le ser banewe kewt**î**. (Tu ji ser ban ve ketî)

Ew le ser banewe kewt. (Ew ji ser ban ve ket)

Ême le ser banewe kewt**îm**. (Em ji ser ban ve ketin)

Êwe le ser banewe kewt**in**. (Hûn ji ser ban ve ketin)

Ewan le ser banewe kewt**in**. (Ew ji ser ban ve ketin)

Koma Sêyem: Dema Neborî - Lêkerên Têper û Têneper

(Katî Ranebirdû - Karî Têper û Têneper)

Di koma sêyem de ev cînavên pêvebestî tên bikaranîn:

m, ît/yt/î, êt/at, îm/yn, n, n

Mînak-1:

Xwardin - lêkereke têper e

Min xoxeke dexom. (Ez xoxê dixwim)

To xoxeke dexoyt. (Tu xoxê dixwî)

Ew xoxeke dexwat. (Ew xoxê dixwe)

Ême xoxeke dexoyñ. (Em xoxê dixwin)

Êwe xoxeke dexon. (Hûn xoxê dixwin)

Ewan xoxeke dexon. (Ew xoxê dixwin)

Mînak-2:

çûn - lêkereke têneper e

Min deçim. (Ez diçim)

To deçî. (Tu diçî)

Ew deçêt. (Ew diçe)

Ême deçîn. (Em diçin)

Êwe deçin. (Hûn diçin)

Ewan deçin. (Ew diçin)

1.2. Cînava Xweyî - Cênawî Xoyî (Reflexive Pronoun)

Hinek zimannas cînava xweyî wekî 'cînava vegerok' jî bi nav dikan. Di zarê Kurmancî de cînava 'xwe' di warê zayendî de nêtar e, di warê mêjerî de bêhêl e û cînavên pêvebestî jî wernagire.

Mînak:

Ez **xwe** dibînim.

Min **xwe** dît.

Di awêneyê de li **xwe** temaşe dike.

Wê mala **xwe** bar kir.

Di zarê Kurmancî de cînava xweyî 'xwe' nêtar û yekjimar e.

Di zarê Soranî de cînava 'xo' nêtar e, lê di warê mêjerî de bi cînavên likaw(pêvebestî) dibe pirjimar jî dibe yekjimar jî.

Tak(Yekjimar)

Xom

Xot

Xoy

KO(PIRJIMAR)

Xoman

Xotan

Xoyan

Mînak:Min **xom** royîştîm bo şarî Dêrsim. (Ez bi xwe çûm bajarê Dêrsimê)To **xot** royîştî bo şarî Dêrsim. (Tu bi xwe çuyî bajarê Dêrsimê)Ew **xoy** royîşt bo şarî Dêrsim. (Ew bi xwe çû bajarê Dêrsimê)Ême **xoman** royîştîm bo şarî Dêrsim. (Em bi xwe çûn bajarê Dêrsimê)Êwe **xotan** royîştîm bo şarî Dêrsim. (Hûn bi xwe çûn bajarê Dêrsimê)Ewan **xoyan** royîştîm bo şarî Dêrsim. (Ew bi xwe çûn bajarê Dêrsimê)**1.3. Cînavên Nîşaneyî - Cênawî Nîşaneyî(Edmontrative Pronoun)**

Ev cure cînavana jî cihê navdêran digirin û tiştek nîşanî me didin. Di zarên Soranî û Kurmancî de bi pîranî mîna hev bin jî lê xalên ji hev cuda dibin jî hene. Di zarê Soranî de cînavên nîşaneyî dûr û nêzîkbûna ku cihê nav girtiye nîşan didin û pirjimar û yekjimar in. Di zarê Kurmancî de jî digel heman taybetmendiyên tewang wate xwerû û tewandî û nêrî û mêtî jî pêve diyar dibin.

Zarê Soranî - Cînavên Nîşaneyî		
Kes	Nêzîk	Dûr
Tak/Yekjimar	em, eme	ew, ewe
Ko/Pirjimar	eman, emane	ewan, ewane

Zarê Kurmancî - Cînavên Nîşaneyî						
Kes	Nêzîk			Dûr		
	Xwerû	Tewandî		Xwerû	Tewandî	
		Nêr	Mê		Nêr	Mê
Yekjimar	ev	evî/vî	evê/vê	ew	ewî/wî	ewê/wê
Pirjimar	ev	evan		ew	ewan	

Mînak-1:

Ew dare helmekêşe çunke wişk nebuwe, **eme** helbikêşe.

Wê darê hilmekşîne çûnkî hişk nebûye, **vê** hilbikêşe.

Mînak-2:

Ba **ewe** bilê. // Bila **ew** bibêje.

Eme bilê baştîre. // **Ev** bibêje baştir e.

Mînak-3:

Emane Kurdînas in, **ewaneş** Firangnas. // **Ev** Kurdînas in, **ew** jî Firangnas.

Têbinî: Di zarê Kurmancî de morfîmek (ê hanê, a hanê, ên hanê)) heye ku nîşandanê bihêztir dike. Ev morfîme hem di cînavên nîşaneyî de hem jî rengderên nîşaneyî de bi kar tê. Herwiha li şûna morfîma 'ê hanê, a hanê, ên hanê' dikare morfîma 'a' jî bigire.

Mînak-1:

Ev ê hanê dibêje. -- **Eva/va** dibêje.

Ew ê hanê bi zarê Zazakî nizane. -- **Ewa/wa** bi zarê Zazakî jî nizane.

Ev a hanê neçûye. -- **Eva/va** neçûye.

Ew a hanê bi zarê Soranî nizane. -- **Ewa/wa** bi zarê Soranî nizane.

Ew ên hanê hînê jenandina bilûrê nebûne.--**Ewana/wana** hînê jenandina bilûrê nebûne.

Ev ên hanê bi zarê Goranî jî nizanin. -- **Evana/vana** bi zarê Goranî jî nizanin.

1.4. Cînavên Girêkî - Cênawî Geyener (Relative Pronoun)

Cînavên girêkî hevokan bi hev ve girê didin. Di zarê Kurmancî de 'ê ku, a ku, ên ku' sê cînavên girêkî hene. 'ê ku' nêr e, 'a ku' mê ye û 'ên ku' jî pirjimar e.

Di zarê Soranî de 'hî ke' yan jî 'î/y ke' ye.

Mînak-1:

Kesek hat. Ew kesê hat mamostayê min e.

Ev herdû hevokana bi cînava girêkî dikare bibe hevok.

Kesê **ku** hat mamostayê min e. // Ew kesey **ke** hat mamostay mine.

Ê ku hat mamostayê min e. // **Hî ke** hat mamostay mine.

A ku bû yekem hevjinê min e. // **Hî ke** yekemînê be destî hêna hawserekeme.

Ên ku xelatên serkeftinê girtin Kurd bûn. // Ewaney **ke** xelatî serkeftin werîgirt Kurdbûn.

Mînak-2:

Piyawey **ke** balaberze bawkime. // Peyayê/zilamê **ku** bejinbilind e bavê min e.

1.5. Cînavên Pirsyarî - Cênawî Pirsyarî (Înterrojîve Pronoun)

Cînavên pirsyarî di nav hevokê de pirsê cînavên dikin û bi vî awayî wan didin nasandin. Cînavên pirsyarî her yek cureyê cînavêk dide nasîn. Hinek cînavên pirsyarî wiha ne:

Kî-kê//kê: Ev cînavê pirsê kesan dike. Di zarê Kurmancî de ev cînavê ditewe. Cînavê 'kî' pirsê peyva xwerû dike, cînavê tewandî 'kê' jî pirsê peyva tewandî dike. Lê di zarê Soranî de tewang tune ye, lewra tenê wekî 'kê' ye.

Mînak-1:

Kî sêvê dixwe? // **Kê** sêw dexwat?

- **Rojîn** sêvê dixwe. // **Rojîn** sêw dexwat.

- **Ew** sêvê dixwe. // **Ew** sêw dexwat.

Mînak-2:

Kê sêw xwar? // **Kê** sêw xwardî?

- **Rojînê** sêw xwar. // **Rojîn** sêw xwardî.

- **Wê** sêw xwar. // **Ew** sêw xwardî.

Çi: Ev cînavê pirsê tiştan dike. Cînavê 'çi' di zarê Soranî de jî di zarê Kurmancî de jî cinaveke nêtar e.

Mînak-1:

Nivîskar **çi** dinivîse? // Nûsereke **çi** denûsê?

- **Nameyekê** dinivîse. // **Nameyekî** denûsê.

Kîjan//kam-kame: Ev cînavê di zarê Kurmancî ditewe dibe pirjimar û yekjimar. Di zarê Soranî de jî pirjimar û yekjimarê wê hene.

Mînak-1:

Kîjanê got? // **Kam** gut?

Kîjanî got? // **Kam** gut?

Kîjanan got? // **Kamyân** gut?

Te perê xwe da **kîjanan**? // Pareket da be **kameyan**?

Çiqas/Çend: Pirsî çend pirsî cînavên jimarîn dike. Di zarê Kurmancî de tevî 'çend' cînavê 'çiqas' jî tê bikaranîn.

Mînak-1:

Çiqasî/çendan ji te re bişînim? // **Çendit** bo binêrim?

- **Çaran** jê bişîne. // Lewane **çaryan** binêrît.

Ka-kanê//kiwa-kiwanê:

Mînak-1:

Kiwa wilatim? // **Ka** welatê min? / **Kanê** welatê min?

Aya//gelo:

Mînak-1:

Aya ewaniş legelmanda dên bo seyran? // **Gelo** ew jî bi me re tîn bo Seyranê?

Çima/çira/qey:

Mînak-1:

Aya êwe le giwê gada nûstûn? // **Gelo** hûn di guhê ga de raketîne?

Key/kengê/kînga:

Mînak-1:

Key hatin? // **Kengê** hatin? / **Kînga** hatin?

Kengê deron? // **Kengê** diçin? / **Kînga** diçin?

1.6. Cînavên Nediya - Cênawî Nadiya (Indefinite Pronouns)

Cînavên nediya cihê kes û tiştên nenas û nediya digirin.

Di zarê Kurmancî de hinek cînavên nediya wiha ne:

Yek, kes, kesek, her kes, filan, bêvan, hemû, hin, hinek, hîç, gellek, piçek, pir, gişt/gişk, pariyek.

Di zarê Soranî de hinek cînavên nediyar wiha ne:

Yekê, kes, kesêk, her kes, filan, fisar, hemû, hendê, hîç, gellek, kemek, kemê, zor, kabira, tozê.

Mînak:

Yekê pertûkekem bird. // **Yekê/yekî** pirtûka min birin.

Kes naçête gorri **kes**. // **Kes** naçe gorra **kesî**.

Filan lêre çî dekat? // **Filan(filan kes)** li vir çî dike?

Nazanim **fisar** hat. // Nizanim **bêvan(bêvankes)** hat.

Hemû be hawarî Mahabadewe çûn. // **Hemû** bi hawara Mahabadê ve çûn.

Hendê hatine pêş? // **Ewqas** hatine pêş.

Tozê le awakeda westa. // **Pariyek** di avê de westiya.

Hîç le nenamekan helmekêşe. // Ji şitilan **hîç** raneke.

Hîneke le zarî gozeke derîbihêne. // **Ewkê** ji hundirê gûzê derbixe.

1.7. Cînavên Xwedîtiyê - Cênawî Heyî (Possessive Pronoun)

Di zarê Kurmancî sê dane cînavên xwedîtiyê hene. 'ê/yê' şûna navdêrên nêr digire, 'a/ya' şûna navdêrên mê digire û 'ên' jî şûna navdêrên pirjimar digire.

Di Zarê Soranî de jî cînava xwedîtiyê 'hî' ye.

Mînak-1:

Espî toye. // Hespê te ye.

Hî toye. // **Ê** te ye.

Gulî mine. // Gula min e.

Hî mine. // **A** min e.

Sêwekanyan dest lê meden. // Dest mede sêvên wan.

Hî ewan dest lê meden. // Dest mede **ên** wan.

1.8. Cînavkên Jimarîn - Cênawî Jimareyî (Numeral Pronoun)

Jimarnav jî dikarin cihê navdêran bigirin û bibin cînavên jimarîn. Di zarê Soranî de jî di zarê Kurmancî de jî ji bilî hejmarê 'yek' hemû hejmar dikarin bibin cînavên jimarîn. Ji ber ku 'yek' cînava nediyar e.

Mînak-1:

Çend kesin? // Çend kin?

Çiwarin. // Çar in.

Hewtin. // Heft in.

BEŞA DUYEM

LI GOR HINEK ZIMANNASAN CUREYÊN CÎNAVAN

Zimannasên rêzimana Kurmancî û ya Soranî li ser pênasikirina cînavê xwediyê heman nêrînê ne. Li gor hemûyan jî cînav ew qertaf, peyv an jî morfîm in ku li cihê navdêran tên bikaranîn. Lê belê zimannasên Kurdî li ser hejmar, parvekirin û corên cînavan xwediyê nêrînên cuda ne. Nav û têgehên cuda li cînavê kirine. Celadet Bedirxan û Kamûran Bedirxan di lêkolînên rêzimanî de ji bo cînavê têgeha 'pronav' bi kar anîne. Feqî Husên Sagnîç têgeha 'cînavk', Seyda Reşîdê Kurd têgeha 'bernav', Seyda Sadiq Behadînê Amîdî û Qenatê Kurdo têgeha 'cînav' bi kar anîne. Ku di vê lêkolînê de jî bi hinceta ku ev têgeha nêzîkî têgeha 'cênaw'a Zarê Soranî ye têgeha 'cînav' hatiye bikaranîn.

Çawa ku lêkolerên rêzimana Zarê Kurmancî di warê navlêdanîna têgeha cînavê de ji hev veqetiyane di warê hejmara cînavan de jî ji hev cuda bûne.

Hinek zimannasan corên cînavan di zarê **Kurmancî(Kurmanciya Jorîn)** de wiha dabeş kirine:

1- Mîr Celadet Elî Bedirxan di pirtûka **'Bingehên Gramêra Kurdmancî'**¹ de cînav kiriye 8 beşên sereke:

- Cînavên Kesîn
- Cînavên Îşarkî
- Cînavên Girêkî
- Cînavên Pirsyarî
- Cînavên Nebinavkirî
- Cînavên Xwedîn (Xwemalî)
- Cînavên Berbihevîn
- Cînavên Lihevxiştî

2- Seyda Reşîdê Kurd di **'Rêzimana Zimanê Kurmancî'**² de cînav kiriye 6 beş:

¹ Celadet Bedirxan - Bingehên Gramêra Kurdmancî - Nûdem - Stockholm 1994 - Rûpel 53-77

² Reşîdê Kurd - Rêzimana Zimanê Kurmancî - Şam 1956 - Rûpel 67-74

- Cînavên Kesok
- Cînavên Nîşandan
- Cînavên Arzî (Milkî)
- Cînavên Pêgih
- Cînavên Pirsiyarî
- Cînavên Nependî

3- Seyda Sadiq Behadîn Amîdî di 'Rêzimana Kurdî'³ de cînav kiriye 8 beş:

- Cînavên Kesî
- Cînavên Heyî
- Cînavên Nîşankirinê
- Cînavên Bêhêz
- Cînavên Xweyî
- Cînavên Pêgeh
- Cînavên Pirsiyarî
- Cînavên Nadiyar

4- Mîr Kamîran Bedirxan di 'Rêzimana Zimanê Kurdî'⁴ de cînav kiriye 10

beş:

- Cînavên Kesîn
- Cînavên Destedaniyê
- Cînavên Pêşker
- Cînavên Girêkî
- Cînavên Pirsiyarî
- Cînavên Nebinavkirî
- Cînavên Bîrdar
- Cînavên Hevedudîtiyê
- Cînavên Nebinavkiriyên Hevedudaniyê
- Cînavên Kurt

³ Seyda Sadiq Bahadîn Amîdî - Rêzimana Kurdî - Bexda 1987 - Rûpel 203-265

⁴ Kamîran Bedirxan - Rêzimana Zimanê Kurdî - Parîs 1971 - Rûpel 22-26

5- Feqî Husên Sagniç di 'Hêmana Rêzimanî Kurdî'⁵ de cînav kiriye 12 beş:

- Cînavên Kesîn
- Cînavên Zîvirandî (Hêzdar)
- Cînavên Hevayî
- Cînavên Kevnê Lêkerî
- Cînavên Kevnê Daçekî
- Cînavên Îşarkî
- Cînavên Pirsiyarî
- Cînavên Qertafî
- Cînavên Xwedîtî
- Cînavên Girêkî
- Cînavên Pêwendî
- Cînavên Nekifşî

6- Li gor pirtûka 'Rêzimana Kurmancî'⁶ ya Samî Tan jî 12 cor cînav hene:

- Cînavên Kesane
- Cînavên Şanîdanê
- Cînava Vegerok
- Cînava Qertafî
- Cînavên Kesandinê
- Cînavên Berbihevîn
- Cînavên Lihevxiştî
- Cînavên Nebinavkirî
- Cînavên Xwedîtiyê
- Cînavên Girêkî
- Cînavên Jimarîn
- Cînavên Pirsiyarî

⁵ Feqî Huseyn Sagniç - Hêmana Rêzimanî Kurdî - Sitenbol 1991 - Rûpel 61-75

⁶ Samî Tan - Rêzimana Kurmancî - Sitenbol 2011 - Rûpel 121-158

7- Kadri Yıldırım di berhema xwe ya '**Kurtçe Dîlbîlgîsî**'⁷ de cînav kiriye 8 beş:

- Cînavên Kesî
- Cînavên Nîşanî
- Cînava Vegerok
- Cînavên Xwedîtiyê
- Cînavên Hevbeşiyê
- Cînavên Lihevxiştî
- Cînavên Nediya
- Cînavên Pirsyarî

8- Deham Ebdulfetah di lêkolîna xwe ya '**Cînav di Zimanê Kurdî de**'⁸ cînav kiriye 7 beş:

- Cînavên Kesî
- Cînavên Nîşandanê
- Cînavên Bêhêl(Bêlayan)
- Cînavên Pirsyarî
- Cînavên Girêkî
- Cînavên Peywendî(Heyî)
- Cînavên Nenas(Nebinavkirî)

Di **Zarê Soranî(Kurmanciya Naverast)** de jî li ser cînavan lêkolînên girîng hatine kirin. Di Zarê Soranî de ji bo têgeha cînav zare û têgehên wêkî '**cênaw, ranaw û zemîr**' hatine bikaranîn. Lê di nav van têgehan de herî zêde 'cênaw' tê bikaranîn. Di materyal û pertûkên ku ji aliyê Wezaretê Perwerde û Wezaretê Xwendina Bala yê Herêma Kurdistan ve tên çapkirin de zareya 'cênaw' tê bikaranîn.

Lêkolerên rêzimana vî zarê Kurdî li ser navlêkirin û pênasîya cînavê xwediyê nêrînên nêzîkî hev bin jî di warê hejmara cînavan de xwediyê tezên cuda ne. Di vî warê de lêkolînên hinek zimannasan wiha ne:

⁷ Kadri Yıldırım -Kürtçe Dilbilgisi Kurmancî Lehçesi -Türkiye'de Yaşayan Dilleri Enstitüsü Yayınları - Mêrdîn 2012 - Rûpel 228-247

⁸ Deham Ebdulfetah - Cînav di Zimanê Kurdî de - Sitenbol 2006 - Rûpel 5-85

1- Qanatê Kurdo di berhema **'Rêzimanî Kurdî le Diyalêktî Xwerû û Jûrû'**⁹ de cînav kiriye 10 cor:

- Cînavên Kesî
- Cînavên Likaw(Pêvebestî)
- Cînavên Nîşane
- Cînavên Xweyî
- Cînavên Pirsîyar
- Cînavên Heyî
- Cînavên Diyar
- Cînavên Nediya
- Cînavên Çendî
- Cînavên Nefî(Neyînî)

2- Seyday Zanyar Tewfîq Wehbî di pirtûka **'Destûrî Zimanî Kurdî'**¹⁰ cînav bi ser 7 coran ve parve kiriye:

- Cênawî Kesî Serbixwe
- Cênawî Nîşaneyî
- Cênawî Lêkder
- Cênawî Mubhem
- Cênawî Pirsî
- Cênawî Xoyî
- Cênawî Milkî

3- Nûrî Elî Emîn di **'Qewaidî Zimanî Kurdî le Nehw û Serf'**¹¹ cînav kiriye 4 beş:

- Cînavî Ciwê(Serbexo)
- Cînavî Likaw(Pêvebestî)
- Cînavên Heyî
- Cînavên Îşarî

⁹ Qanatê Kurdo - Rêzimanî Kurdî le Diyalêktî Xwarû û Jûrû - Moskow 1978 - Rûpel 99-120

¹⁰ Tewfîq Wehbî - Destûrî Zimanî Kurdî - Bexda 1929 - Rûpel 80-140

¹¹ Nûrî Elî Emîn - Qewaidî Zimanî Kurdî le Nehw û Serf - Bexda 1956 - Rûpel 61-70

4- Nûrî Elî Emîn di berhema xwe ya '**Rêzimanî Kurdî**'¹² de jî hejmara cureyan dike 7.

- Cênawî Kesî
- Cênawî Xoyî
- Cênawî Îşarî
- Cênawî Geyener
- Cênawî Pirsiyarî
- Cênawî Nadiyar
- Cênawî Heyî

5- Mistefa Xurremdil di '**Serfî Destûrî Zebanî Kurdî Soranî**'¹³ de cînav kiriye 4 beş.

- Cênawî Kesî
- Cênawî Nîşaneyî
- Cênawî Hawbeşî(Hevbeş)
- Cênawî Xaweniyetî(Milkî)

6- Kurdistan Mukriyanî¹⁴ di lêkolînekê xwe de diyar kiriye ku 10 cure cînav hene.

- Cênawî Kesî
- Cênawî Likaw
- Cênawî Nîşaneyî
- Cênawî Pirsiyarî
- Cênawî Çendî
- Cênawî Heyî
- Cênawî Xoyî(Xweyî)
- Cênawî Nadiyar
- Cênawî Diyar
- Cênawî Neyînî

¹² Nûrî Elî Emîn - Rêzimanî Kurdî - Çapxaney Şehab - Hewlêr 2013 - Rûpel 97-119

¹³ Mistefa Xurremdil - Sêrfî Destûrî Zebanî Kurdî Soranî - Tebrîz 1968

¹⁴ Kurdistan Mukriyanî - Govarî Zanyarî Destey Kurd - Jimarey Hewtem - Bexda 1980 - Rûpel 229-254

7- Mesûd Mihemed jî di lêkolînekî de cînav bi ser 7 beşan ve veqetandiye.

- Cênawî Kesî
- Cênawî Lêkder(Geyener)
- Cênawî Pirsiyarî
- Cênawî Îşarî
- Cênawî Xoyî
- Cênawî Heyî
- Cênawî Nadiyar

2. Hinek Morfîmên ku Wekî 'Cînav' Hatine Binavkirin

Cînavên nîşaneyî yên tewandî '**vê, vî, wê, wî**' dema bi daçekên '**li, ji, di, bi**' re tîn ba hev dikeljin û dibin '**lê, jê, tê, pê**' û hinek lêkoler û zimannasên Kurdî wan wekî '**cînavên lihevxiştî**' bi nav dikin. Di nav van zimannasan de zimannasên girîng ên wekî Samî Tan¹⁵ û Kadrî Yildirim¹⁶ jî hene. Lê li gor min ew cînavên nîşaneyî ne, tenê di sazkirina peyv an jî hevokan de bi daçekan re hatiye kelijandin.

Mînak:

Li wî mexe.

Lê mexe.

Ez **li malê** dimînim.

Ez **lê** dimînim.

Ez ê **ji wî** re bibêjim.

Ez ê **jê** re bibêjim.

Em **ji wê** bêzar bûn.

Em **jê** bêzar bûn.

Ez **bi hevalek** re çûm Hewlêrê.

Ez **pê** re çûm.

¹⁵ Samî Tan - Rêzimana Kurmancî - Weşanên Enstîtûya Kurdî ya Sitenbolê - Sitenbol 2011 - Rûpel 121-158

¹⁶ Kadri Yıldırım -Kürtçe Dilbilgisi Kurmancî Lehçesi -Türkiye'de Yaşayan Dilleri Enstitüsü Yayınları - Mêrdîn 2012 - Rûpel 228-247

Ez **bi wî** re napeyîvim.

Ez **pê** re napeyîvim.

Di dibistanê de hezar xwendekar hene.

Di wê de hezar xwendekar hene.

Tê de hezar xwendekar hene.

Hinek zimannasan qala '**cînava qertafi**' jî kirine. Lê li gor min di binavkirina van cureyan de hinek çewtî hene.

Mînak:

'Cînava Qertafi' di rastiya xwe de cînaveke kesî ya serbixwe û tewandî ye.

Ji nimûneyek ku zimannasên ku qala 'cînava qertafi' kirine wiha ye.

(Min tasek av daye wê/wî=> Min ew(tasek av) daye wê=>Min daye wê=> Min dayê)¹⁷

Te gulekê da wê hevalê=> Te ew(gulekê) da wê=>Te da wê=>Te dayê

Te gulek da vî hevalî=> Te ew(gulek) da vî=>Te da vî=>Te dayê.

'ê'ya ku zimannas wekî cînava qertafi dibîne, di rastiya xwe de kurtkirina cînava kesê sêyemê serbixwe, yekjimar û tewandî ye.

Ev cînava kurtkirina cînava nîşaneyî jî nîn e, cînava kesê sêyemê serbixwe û yekjimar e.

Bi piraniya zimannasên Kurdî morfîmên 'hev' 'êk' û herwiha formên wan ên 'Hev', 'Hev û du', 'hev û din', 'êk û du', 'êk û din' wekî '**cînavên berbihevîn**' bi nav dikin. Derheqê morfîma ku ji aliyê Celadet Elî Bedirxan û Samî Tan ve wekî 'Cînava Berbihevîn' ji aliyê Kadrî Yildirim ve jî 'Cînava Hevbeşiyê' hatiye binavkirin, herçend bi tamamî pûç nekim ku ew ne 'cînav' e, lê di hinek mînakên ku zimannasan ew wekî 'cînava berbihevîn' dane xuyakirin de ne cînav e.

¹⁷ Samî Tan - Rêzimana Kurmancî - Weşanên Enstîtûya Kurdî ya Sitenbolê - Sitenbol 2011 - Rûpel 136

Mînak¹⁸-1:

Em bi **hev du** re mezin bûn.

bi hev du re: 'hev du' bi alîkariya daçeka 'bi...re' di vê mînakê de hevalkar e. Ji ber ku wesfa lêkera 'mezinbûn'ê dike û der heqê çawaniya mezinbûnê de pêzanînan dide me.

bi hev dû re mezin bûn: Bersiva pirsê 'çawa mezin bûn?', 'bi hev du re' ye.

Mînak¹⁹-2:

Me li hev nihêrî, lê me **hev û din** nas nekir.

Di vê nimûneyê de 'hev û din' bireser e, lê cureyê wê min tam pê dernexist çî ye. Di vê nimûneyê de bêhna cînavê jê were jî bi encamkirina wê ji lêkolerên jêhatîr re dimîne.

¹⁸ Samî Tan - Rêzimana Kurmancî - Weşanên Enstîtûya Kurdî ya Sitenbolê - Sitenbol 2011 - Rûpel 141

¹⁹ Samî Tan - Rêzimana Kurmancî - Weşanên Enstîtûya Kurdî ya Sitenbolê - Sitenbol 2011 - Rûpel 141

ENCAM

Di beşa yekem de cînav hatiye pênasekirin û bi ser 8 cureyan ve hatiye dabeşkirin. Her dû zarên Kurdî Kurmanciya Jorîn û Kurmanciya Naverast(Soranî) hatine berawirdkirin, daku kesên li ser van her du zaran dixebitin, xalên hevbeş û yên cuda bi hêsanî bibînin. Cînav di hînbûn û nasîna zimanekî de kilît û mifteyeke bingehîn e. Îja dema mijar Kurmaniya Jorîn û Kurmanciya Naverast be pêzanîna der barê vê mijarê de hîn girîngtir dibe. Ji ber ku tevî nemana 'nêrîtî û mêtiyê' di peyv û ravekên Kurmanciya Naverast de yek ji ferq û cudahiya herî bingehîn a di navbera Kurmanciya Jorîn û Kurmanciya Naverast de cînav in. Herwiha lêkolerên Kurmancîaxêv bi saya vê berawirdê dibînin ku ji nişke ve Kurmanciya Naverast ji zarê ku pê diaxive re nêzîk dibe.

Ji beşa duyem a vê xebatê derdikeve ku zimannasên Kurd wekî gellek mijarên din di mijara hejmar û cureyên cînavan de jî nelihevkirî ne. Herwiha bi piraniya zimannasan li gorî dilê xwe nav û têgeh/zare/terim ji cureyên cînavan re peyda kirine. Xwendekarek ku li ser cînavan dixebite ger di vî warê de gellek çavkanî li ber dest be, dibe ku di hundirê hefteyekê de nikaribe ji nav van têgeh û zareyan bifilite. Li şûna ku babetê ji hev veçire, dikare hinek din aloz û tevlihev bike. Cînavên Pêvebesti ango Cênawe Likawekan hinek zimannasên Kurdî wekî cureyeke serbixwe daniye, lê li gor min ev cînavana cînavên kesî yên pê ve ne. Herwiha dema bi navdêran re tên nivîsîn cuda tên nivîsîn, lê bi lêkerê re zeliqandî ye. Herwiha di beşa duyem de ew morfîmên ku zimannasan wekî 'cînav' danîne min hewl da bi mînakên wan pûç bikim ew ne cînav in.

Li gor min hokar û sedemên bingehîn ên vê tevliheviya li ser binavkirin û dabeşkirina cînavan wiha ne:

- Zimannasên Kurd ku her yek li beşê ku lê dijîn, bi zimanê cuda perwerde bûne. Lewra ketine bin bandora zimanevaniya Tirkî, Erebî û Farisî. Îca yên ku di bin bandora zimannasiya Farisî de ne, hinek din bi siûd û bi şens in. Ji ber ku Farisî jî di nava Koma Hînd û Ewrûpî de zimanekî nêzîkê Kurdî ye. Lê zimannasên ku di bin bandora zimannasiya Tirkiya Êral-Altayî û Erebiya Hamî-Samî de mane dikarin di warê zimannasiya Kurdî de bigihêjin encamên şaş û çewt ên zimannasiyê. Ji ber ku piraniya zimannasên me ji zimanên biyanî yên

wekî Îngilîzî, Firansî, Rûsî, Almanî nizanin. Ev zimanên biyanî xwediyê qutabxane û ekolên zimannasiyê ne û di van zimanan de têra xwe lêkolînên zimannasiya giştî hatine kirin.

- Ji bo têgeh û zaryên zimannasî danîna navên cuda. Hinek bi nezaniya babetê hinek jî bi qurebûn û pozbilindiya zimannasan ve girêdayî ye. Her zimannasek dixwaze bi danîna têgeh û zaryên keyfî dixwaze bibêje ku zimannasî bi wê/wî dest pê kiriye.

- Saziyên hevbeş û şarezane ên Kurdî yan pir kême yan jî tune ye daku lêkolînên berfireh ên zimannasiyê bi pêş bixin. Ev lêkolînên hanê bi giranî bi hewlên takekesî/şexsî tên kirin. Dema saziyên hevbeş û şarezane tune be, pîvan jî ji keyfiyeta şexsî re dimîne.

- Yeknegirtin û sitandartnebûna zimanê nivîskî û sitandarnebûna her zarek Kurdî berhem, ked û xwîdana lêkoleran naherekîne ser heman golê. Bo nimûne, ger zimaneki yekgirtî yê nivîskî yan jî ji bo zarek Kurdî yekgirtineke nivîskî hebûya, navên cuda ji bo terim û têgehyan nedihat bikaranîn. Di lêkolînên zanistî de danîna nav û têgehên cuda cuda bi serê xwe rê li ber aloziyan vedike.

- Nebûna budceyek ji bo xebat û lêkolînên zimanêvanîyê. Zimannas şarezayane bi vî karî re mijûl nabin. Ji ber ku debara xwe ji zimannasiyê peyda nakin. Bi piraniya zimannasên Kurdî debara xwe ji karek din peyda dikin. Wate di ber karê esasî re bi zimannasiyê re jî mijûl dibin.

ÇAVKANÎ

- 1- Celadet Bedirxan - Bingeên Gramêra Kurdmancî - Nûdem - Stockholm 1994
- 2- Deham Ebdulfetah - Cînav di Zimanê Kurdî de - Sitenbol 2006
- 3- Feqî Huseyn Sagniç - Hêmana Rêzimanî Kurdî - Sitenbol 1991
- 4- Kadrî Yildirim-Rêzimana Zarê Kurmancî)-Mêrdîn 2012
- 5- Kamîran Bedirxan - Rêzimana Zimanê Kurdî - Parîs 1971
- 6- Kurdistan Mukriyanî - Govarî Zanyarî Destey Kurd - Jimarey Hewtem - Bexda 1980
- 7- Mistefa Xurremdil - Serfî Destûrî Zebanî Kurdî Soranî - Tebrîz 1968
- 8- Mûrad Ciwan - Rêzimana Kurdî bi Şîrovekirina Tirkî - Amed 2014
- 9- Nûrî Elî Emîn - Rêzimanî Kurdî - Hewlêr 2013
- 10- Qanatê Kurdo - Rêzimanî Kurdî le Diyalêktî Xwerû û Jûrû da - Moskow 1978
- 11- Reşîd Kurd - Rêzimana Zimanê Kurmancî - Şam 1956
- 12 - Samî Tan - Rêzimana Kurmancî - Weşanên Enstîtûya Sitenbolê - Sitenbol 2011
- 13- Salim Nawxoş & Nerîman Xoşnaw - Zimanewanî-Çapxaney Minare-Hewlêr 2010
- 14- Seyda Sadiq Bahadîn Amîdî - Rêzimana Kurdî - Bexda 1987
- 15- Tewfîq Wehbî - Destûrî Zimanî Kurdî - Bexda 1929

ÇAVKANIYÊN DÎJÎTAL

<http://e-weje.com/zimane-kurdi-zimaneki-ergativi-ye/>

<http://www.kurdigeh.com/rwdx/sitepdf/Ib.Seydo-terminoloji.pdf>

<https://www.kurdistanamin.wordpress.com/category/zimane-kurdi>

<http://www.tirejafrin.com/pdf/naina%20rezimana%20kurdi.pdf>


<https://www.translate.google.com.tr/?hl=tr&tab=wT>

<http://www.zazaki.net/haber/kurmanc-soran-du-zare-yan-du-zimann-cuda-893.htm>

<http://www.zazaki.net/haber/ferheng-terman-edebiyat-2300.htm>

<https://www.zimannas.files.wordpress.com/2016/07/hejmar7.pdf>

<https://zimannas.wordpress.com/2016/08/04/cinaven-kurdi-bes-2/>



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Tezsiz Yüksek Lisans Projesi

SORANİ VE KURMANCİ LEHÇELERİNDE

ZAMİRLER

Serkan İnce

13721288

Danışman

Yrd. Doç. Dr. Mustafa ASLAN

Mardin - 2018